Hilbijartinên Başûr, Mesaja Bakur!

Kakşar Oremar
Email: kakshar_oremar@yahoo.de

Kemilîna prosesa siyasî di nava hemû netewên cîhanê da xwedî pêvajoyek dûr û dirêje. Tevî ku hinek netewe bi dehan sale xwedî dewleteke xwe ya sîyasî û serbixwe ne jî, lê hê nebûne yek. Nimune welatên Koreya bakur û başûr. An jî Ewropiya 500 sala dersa demokrasiyê xwendin û bi azmonên mezin gehiştin vira.

Di nava Kurdên çar parên Kurdistanê da xwezî an jî hesreta herî mezin ew bûye(hê jî ewe) ku bibin yek û xwedî dewleteke xwe ya serbixwe bin. Bo vê armancê siyastemedar, pêşmerge an jî gerîlayên Kurd qet sinorên destçêkirî nas nekirine. Carna ji Amed û Colemêrgê xwe gehandine Mehabadê, carna ji Qamîşlo û Sine xwe gehandine Barzan an jî hineka ji Xaneqîn û Kirmaşanê berê xwe dane Qendîl û Amedê. Ev karê Kurda pir watedare û xwedî mesajeke girîng û di çavê dagîrgerên Kurdistanê da jî tehlûkeke mezine.

Ji sedsala 19an heya roja îro rêxistin û partiyên siyasî di Kurdistanê da xebitîne ku xwe nêzî hev bikin. Bizaveke wiha tevî ku pir hêdî ber bi pêşve meşyaye, lê qet nesekiniye û hemû astengiyên ku li pêşberî wan hebûne, derbas kirine. Sala 1879 Şêx Ûbeydulahê Nehirî konfiransa ku serok eşîret û gire-girên Kurda têda beşdar bûn, pêk anî, komara Kurdistan(Mehabad 1946) bi istratêjiya ku dabû ber xwe, dixwest ku Kurdên çar parên Kurdistanê di bin siya ala Kurdistanê da bigehîne hev, Barzanîyê mezin demekê bi kar û xebata xwe ya siyasî û meşa xwe ya dîrokî xewa şev û roja di çavên dijiminan da herimandibû.
Ev evîna mezin ya ji bo hevgirtinê sal bi sal di nava Kurdan da mezin bûye, lê ji salên 1990an û pêda ku li bakur û başûrê Kurdistanê di qada siyasî da pêngavên mezin hatin avêtin, pilanên domdirêj yên Tirkiye, Îran, Îraq û Sûriyê jî tevlîhev bûn. Tirafîka hatin-çûyînên Tehran-Enqere, Şam- Enqere, Enqere-Bexda bala hemû cîhanê kişand ser xwe. Lê encama hemû hevdîtinên wan vala bû. Sedem?

Bi nêrîna min sedemên sereke ev bûn: PKK sal bi sal bihêztir û mezintir dibû. Ew mezintirîn rêxistina siyasî bû ku Kurdên her çar parên Kurdistamnê ji bo hîvîyên mezin li dora xwe kom kirin. Li başûr KDP û

YNK piştî şerên giran li hev hatin û desthilatdariya pareke mezin ji axa welat xistin jêr desthilatdariya xwe. Kurdên parên din yên Kurdistanê jî bi dilsojiyek mezin xebitîn ku vê destkefta mezin mîna guleke sava bi rindî biparizên ku rojekê bêhna wê bigehe herd dera welat. Li wira Kurda liyaqeta xweîdarekirinê ji raya gişî ya cîhanê ra îspat kirin. Mezinahî û hêza PKKê jî gehişt astekî ku çalakî û xebata xwe ji serê çiyayên Kurdistanê anî nava bajar û metrepolên Kurdistan û Tirkiyê. Xebata siyasî êdî berçêla rayedarên Tirk girt û êdî nedikarîn mîna Mistefa Kemal realîta Kurd înkar bikin. Derya ji xwîna keç û xurtên Kurda dihat ku wan bifetisîne û sîstema Kemalîzimê hilweşîne. Û elbete di vê navê da hêdî-hêdî partîyên Kurda jî berjewendiyên Kurdistana mezin ji yên xwe muqedestir dîtin û hissên yekîtiya netewî di nava dil û mejiyê lîderên Kurd da jî bihêztir û mezintir bû. Xewna hezar salan hêdî-hêdî digehe encamekê.

Berî çend rojan mesaja rêzdar Murat Karayilan û piştgîriya ji serokatiya rêzdar Mesûd Barzanî xwedî wateyeke pir mezin û dîrokî bû. Çend sale em dibînin ku rêzdar Barzanî bi helwestên xwe yên Kurdistanî liyaqet û evîna xwe ya ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd bi awayekî aştiyane, ji dost û neyaran ra daye xuyanî kirin. Wî li dijî daxwazên Tirkên ku dixwestin Kurda bi dest hev bidin kuştin, nerazîbûnek tund da diyarkirin û wek bav û kal dibêjin:" şer heya ber derê mala xwe anî...", lê teslîmî xwesteka Tirk û Îranîya nebû. Di rewşên wiha da PKKê jî hem di warê şerê çekdarî û hem jî di xebata siyasî da çalakiyên xwe berfireh û mezintir kirin. Êdî çi rê li ber „Kemalîstên faşîst", „zarokên Xûmêynî yên xwînrêj" û „Erebên qaşo mislman û birakuj" neman.
Rêzdar A. Öcalan bi tena serê xwe û di şertên herî dijwar da bi siyasetek hekîmane, nehişt ku neviyên Osmaniyan di vê sedsalê da careke din bigehin armancên xwe yên qirêj.
Li gor min di dirêjahiya hemû dîroka bizava siyasî ya Kurdistanê da biqasî îro Kurd nêzî hev nebûne. PKK, PDK û YNK rêxistinên Kurda yên herî bihêzin ku ger vê yekîtiya xwe rojekê 100% bigehînin qada piratîkê, ji niha da ez mizgînya Kurdistaneke serbixwe didim we xwîndevanên hêja. Bo min xweştirîn xeber di van çend rojên derbasbûyî da mesja rêzdar M.Karayilan bû ku ev pêngav bi awayekî dûrbînane hatiye avêtin û yê di paşerojê da berhemên mezin biafirîne. Li vira careke din tê xuyanê ku li gor rêzdar Karayilan ji her carê bêtir niha pêwîstiya Kurda bi yekîtiyeke netewî heye. Ev armanca herî pîroz e ku dîroka mirovahiyê yê bi tîpên zêrîn di nava rûpelên xwe binivîse.

Dema li bakurê Kurdistanê 20 kes çûne parlmana Tirkiyê an jî di hilbijartinên ji bo şaredariyê dengê Kurda bû duqat, vê serkeftinê bandoreke mezin li rewşa Kurdên parên din danî. Vê carê serkeftina partiyên mezin li başûrê Kurdistanê jî

xwedî mesajeke wiha ye. Li her dera cîhanê reqabeta di navbera partiyên sîyasî da tiştekî sirûştiye û di avedanîya welat da dibe sedema xizmet û pêşkeftinên mezin. Bi vêra ferhenga demokrasiyê jî dikare bi rindî di nava gel da bibişkive û jiyana civakê derbasî qûnaxeke nû bike. Çend sale ku pêvajoyeke wiha li bakur, rojhelat, rojava û başûrê Kurdistanê destpêkiriye û ger wiha bidome yê Kurdistan di gelek waran da ji welatên cîran pêşdatir biçe.

Di hilbijartinên vê carê yên li başûrê Kurdistanê mesaja bakur hem xwîneke nû xiste nava rehên dilê doza Kurdîniyê û hem jî evîneke tejî şadî di nava Kurdên Kurdistana mezin da afirandiye. Serokatiya serok Barzanî li hemû gelê Kurd pîroz be û piştgîriya PKKê jî pîroztir be.
Êdî Amed û Hewlêrê destê xwe dane hev, ka ew roja ku em bibînin Mehabad, Kirmaşan û Qamîşlo jî destê xwe dirêjî hev bikin?! Xûziya bi wê rojê hevalno!

25. 07. 2009 Elmaniya